
Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar :1180 23-Pûşper-2024 www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

# Hejmara nû ya kovara 'Ji Pênûsa Şehîdên Zindî' derket




Hejmara 3'yemîn a kovara 'Ji Pênûsa Şehîdên Zindî' a gaziyên şer derket.

Kovara 'Ji Pênûsa Şehîdên Zindî' ku ji aliyê Federasyona Gaziyên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê ve tê derxistin bi hejmara 3'yemîn gihîşte ber destê xwîneran.

Di kovara ku bi zimanê Kurdî (zaravayê Kurmancî) û zimanê Erebî hatiye amadekirin de, di serî de cih dide nirxandinên Rêber Abdullah Ocalan ya bi ser navê "Em bibin Şervanên Rast ên Partiya Şehîdan" hatiye dayîn.

Kovarê cih daye nivîsa Sema Aysel a bi ser navê "Bîranînek ji Botanê", "nivîsa Ridvan Qamişlo ya bi ser navê "Heval Azadî dixwest ji bo hevalên gazî projeyan bi pêş bixîne", nivîsa Azad Efrîn bi sernavê "Heval Azadî eşiqê zanebûnê bû", nivîsa Dîcle Tirbespî ya bi sernavê "Du Jinên Azadî Xuliqandin", nivîsa Arjîn Kobanê ya bi sernavê "Bîranînek ji şerê Kobanê".

Dîsa bi sernavê "Destê Protez çi ye û çawa tê bikaranîn" mijarên girêdayî tendurûstiyê hatiye dayîn.

Di dawiya kovarê de jî bi sernavê "Şehîd Nirxên herî pîroz in" wêneyên şehîdan hatine parvekirin.

# Felaketa li Licikê herî kêm wê 100 salî dewam bike

Ji Polen Ekolojiyê Tûgba Kahraman bi bîr xist ku li Licikê qirkirina ekolojîk li qadeke berfireh belav bûye û got, "Siyanur û madeyên kîmyewî yên giran wê tevlî Firatê bibin. Felaket wê herî kêm 100 salî dewam bike."



Li navçeya Licik a Erzînganê 9 karker di binê axê de man ku ji ber felaketa Madena Zêr a Çoplerê hezazê rû da. Karên lêgerînê jî pêr hate rawestandin. Ji Polen Ekolojiyê Tûgba Kahraman li ser mijarê metirsiyên xwe anîne ser ziman.

Tûgba Kahraman diyar kir ku zehmet e bîlançoya ekoqirimê ya bi vê mezinahiyê bê texmînkirin û got, "Hilweşîn li qadeke gelekî berfireh belav bû. Felaketeke welê rû da ku wê bandorê li Tejaneya Firatê û Dîcleyê, li tevahiya Mezopotamyayê bike. Siyanur û madeyên giran ên kîmyewî wê tevlî çemê Firatê bibin. Felaket herî kêm wê 100 salî dewam bike. Ev xaka bi jehr bi 2 milyon metrekup ber bi aliyê çep û rast ve belav bû. Piştî ku baran bariya jî wê tevlî nava ava binê erdê bibe û ji ber ku kutleya kîmyewî nêzî 27 milyon ton e, asta qirkirin û texrîbatê gelekî mezin e ku texmînkirina wê zehmet e. Mirov, heywan, ax û ava me wê bimirin; li şîrketên berpirsyar û hevkarên wan wê tenê cezayê pereyan bê birîn û piştî darizandinê jî wê karê xwe dewam bikin."

Tûgba Kahraman anî ziman ku li gorî gotinên endezyarên hawirdorê û pisporan siyanur a li nava hewayê û madeyên din ên kîmyewî yên hatin bikaranîn wê bi rêya dûkelê tevlî hewayê bibin û got, "Bi vî rengî hemû zindiyên li herêmê bi rêya hewayê wê karibin daqurtînin û ev yek jî wê ji bo tenduristiya gel û hawirdorê bibe pirsgirêk. Dema ku bandor li axê kir, bi rêya gihayên li vê herêmê şîn bû wê bandorê li heywanan û mirovan bike. Ev yek wê bandorê li hemû şênkanî, tenduristiya zindiyan û mirovan bike. Nexweşiyên mîna KOAH û kanserê wê li nifşên nû rû bidin. Dema ku tevlî ava li binê erdê bû wê bibe metirsiyeke mezin ku li qadeke berfireh belav bibe."

Tûgba Kahraman diyar kir ku Tirkiye veguheriye sergoyê Yekîtiya Ewropayê û got, "Bikaranîna siyanur û asbestê di vê astê de nîşan dide ku daxwaza qezencê ya sermayeyê di ser mafê jiyanê yê mirovan û hemû zindiyan re tê dîtin, têkilî û girêdana xurt a Tirkiyeyê ya bi sermayeya navneteweyî nîşan dide. Bi pratîka têkoşîna ekolojîst a çend salên dawî re hate dîtin ku pirsgirêk bi esasî ji ber kapîtalîzmê ye. Bi xurtkirina vê têkoşînê pêşî li qirkirinê dikare bê girtin.

# 'Divê jin di hunerê de astengiyan nas nekin'

**Wênexêz Xeyal Sabir a di wêneyên xwe de bal dikşîne ser rewşa jinan û ji bo danasîna tabloyên xwe beşdarî pêşangehan dibe, bang li jinan dike ku di pêkanîna hunera xwe de astengiyan nasnekin.**



Wênexêz Xeyal Sabir peymangeha hunerê ciwan temam kiriye, bi wêneyên ku çêdike balê dikşîne ser pirsgirêkên jinan.

Xeyal Sabir a dibêje ku ew ji zarokatiyê ve dest bi xêzkirina wêneyan kiriye, di tabloyên xwe de giringî dide jinê û wêneyên jinan xêz dike. Xeyal Sabir derbarê xêzkirina wêne de dibêje: "Min dixwest wêneyên jinan xêz bikim. Di pola 3'yemîn a xwendina peymangeha hunerên ciwan de, min biryar da piraniya tabloyên min wêneyên jinan be."

Xeyal Sabir da zanîn ku her roja xwe bi wêne xêzkirinê derbas dike û herwiha ji bo danasîna wêneyên xwe beşdarî gelek pêşangehan bûye. Xeyal Sabir wiha dibêje: "Di pêşangehan de kesên tên spasiya min dikin dixwazin ez xêzkirina wêneyan berdewam bikim. Ez carna bi şevan wêne xêz dikim û hewl didim hemû kêrhatiyên xwe ji bo xêzkirina wêneyan bikar bînim. Armanca min derxistina hêz û kêrhatiya jinê ye û her wiha tabloyên min behsa êşên jinan dike. Destpêkê ez bi pênûsa dar wêne xêz dikim û piştre boyax dikim. Min zêdetir giringî da wêneyê jinan û di nav de wêneyê dayika min ku bi nexweşiya penceşêrê jiyana xwe ji dest da. Piraniya wêneyên min ji bo dayîka min e."

**'Divê jin li hemberî hunera xwe astengiyan nasnekin'**

Xeyal Sabir amaje bi wê yekê dike ku dema jin di pêkanîna hûnera xwe de rastî astengiyan tên jî divê karên xwe berdewam bikin û got: "Daxwaza min ji bo her jinê ewe ku di her jinekî de û di her temenê de giringî bidin karê xwe û bi xwe li ser lingê xwe rawestin."

Sudoku: Bersiv 92

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 8 | 6 | 5 | 7 | 3 | 2 | 9 | 1 | 4 |
| 4 | 3 | 1 | 9 | 6 | 8 | 7 | 5 | 2 |
| 2 | 7 | 9 | 1 | 4 | 5 | 6 | 3 | 8 |
| 6 | 8 | 7 | 5 | 9 | 1 | 4 | 2 | 3 |
| 5 | 1 | 4 | 3 | 2 | 7 | 8 | 9 | 6 |
| 9 | 2 | 3 | 6 | 8 | 4 | 1 | 7 | 5 |
| 1 | 9 | 6 | 8 | 5 | 3 | 2 | 4 | 7 |
| 3 | 4 | 8 | 2 | 7 | 9 | 5 | 6 | 1 |
| 7 | 5 | 2 | 4 | 1 | 6 | 3 | 8 | 9 |

Sudoku:Pirs 93

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | 8 | | | | 4 | 5 | | |
| 1 | | | 6 | | | | | |
| 4 | 6 | 7 | | | | | | 9 |
| | | 4 | 8 | | | 1 | 6 | |
| | 9 | | 5 | | 2 | | 3 | |
| | 3 | 2 | | | 1 | 8 | | |
| 5 | | | | | | 3 | 2 | 4 |
| | | | | | 6 | | | 1 |
| | | 3 | 2 | | | | 5 | |

## FERHENGA BIWÊJAN

**Xwe pîs kir:**
- Xwe kêm kir; bêxîretî kir; dest hilneanî.

**LISER MIROVÊ FENEK**

**Ava bin kayê ye:**
- Tiştna dike lê mirov pê nahese; fenek e.
**Dikare bibe ser avê avê nediyê:**
- Di xap, hîle û pîleyan de pir jîr e; dikare her kesî bixapîne.
**Dikare mirov têhn bibe ser avê têhn bîne:**
- Bi heman wateyê.
**Kêrvoşkê bi erbaneyê digire:**
- Pir jîre, jêhatî ye, dikare her kesî bixapîne, ti kes pê nikare.
**Mûyek ji riha wî dermanê guriyê ye:**
- Kesekî fenek e; ji bo xapandinê rih berdaye.

**LI SER HESKIRINÊ**

**Av bi devê wî ket:**
- Keyfa wî pir hat; pir jê hes kir.
**Av ji devê wî hat:**
- Bi heman wateyê.
**Av ji devê wî hat xwarê:**
- Bi heman wateyê.
**Ava heft giraran ji devê wî çû:**
- Bi heman wateyê.
**Bi tirdelalî mezin kirine:**
- Bi nazdarî û delalî mezin kirine.
**Bi serê te kim:**
- Sonda min bi serê te ye.
**Bi serê wî sond dixwe:**
- Pir jê hes dike.
**Dema dibêje;… sed… ji devê wî derdikevin:**
- Pir jê hes dike; di dilê wî de pir şîrîn e.
**Dema navê wî hildide hezar nav ji devê wî derdikevin:**
- Bi heman wateyê.
**Eger bimirim ya axê me, eger bimînim ya te me:**
- Ez ji te pir hes dikim; ji bilî te ezê bi ti kesî re nejîm.
**Ez gulekê bi te nadim çandin:**
- Ezê te bi delalî xwedî bikim.
**Ez gunê wî/çavê wî/kîrê wî bixwim:**
- Min jê hes kir; keyfa min ji helwesta wî re hat.
**Gilîza wî herikî:**
- Keyfa wî pir hat; pir jê hes kir.
Gula civatê ye.
- Pir jê tê heskirin; axaftinên wî pir xweş in.
**Gula malê ye:**
- Pir jê tê heskirin; pir baş e; pir bedew e; mal bi wê xweş dibe.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

# Têkoşîna gelan ya ji bo azadiya Rêber Apo berdewam e




Gelê kurd û azadîxwazên cîhanê bi beşdarbûna xwe ya girseyî di pêngava cîhanî ya ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber Apo de careke din tekez kirin ku ji bo azadiya Rêber Apo û belavkirina fikirê wî, ew ê têkoşînê berdewam bikin.**R-3**


# 'Bi hatina havînê re zehmtiyên koçberan zêdetir dibin'



Serokê Nivîsgeha Karûbarên Koçber û Penaberan Şêxmûs Ehmed diyar kir ku bi hatina demsala havînê re êşa koçberên di kampan de zêdetir dibe. Herwiha Ehmed dest nîşan kir ku tenê Rêveberiya Xweser û hin saziyên xwecihî alîkariya koçberan dikin.**R-6**

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar : 1180 23-Pûşper-2024 www.ronahi.net/ku/ Nirx: 500 L.S

# 'Keça Kurda' mala xwe ya ji heriyê kir muzexane



Di her amûr û rûyê peykerekî de çîrokek heye ku ne bi pênûsê, lê bi tiliyên Hizniya Keça Kurda bi modêl û sitîlan bi şêweyekî hunerî hatiye xêzkirin. Hizinya diyar kir ku Ew jineke kurd e, û bi derfetên xwe yên xwezayî karê xwe dike."**R-2**

# HEVKARÊN GUHERTINA DEMOGRAFÎK LI EFRÎNÊ HEVKARÊN SÛCÊN DIJMIROVÎ NE

**Dewleta Tirk a dagirker li Efrîna dagirkirî planên kuştin, revandin, koçberkirina şêniyên resen û guhertina demografîk bênavber didomîne. Dagirkerî bi alîkariya hin dezgeh û saziyên Qeterî, Kiwêtî û Filestînî kamp û malên mitîngeriyê ava dikin, herwiha hewil dide demografiya herêmê bi giştî bidin guhertin. Hevseroka Desteya Hiqûq û Edaletê ya Rêveberiya Xweser Ya Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê Mizgîn Hesen diyar kir ku guhertina demografiya li Efrînê sûcekî şer e û pêwîste saziyên navneteweyî li hemberî vî sûcî bi erkên xwe yên exlaqî rabin.R-5**










# Dengê zindî; Hesen Zîrek



Hunermendê navdar Hesen Zîrek ê bi 'Ey Nîştimanê Kurdistan' tê naskirin, beriya 51 salan bi nexweşiyekê koça dawî kir. Hesen Zîrek li pey xwe çandek, arşîvek hêla û hê jî dengê Zîrek zindî ye.**R-7**

# Hilbijartinên Herêmî yên Bakur û Rojhilatê Sûriyê û bandorên wê...(1)



Piştî di 15'ê Kanûnê 2023'an de Hevpeymana Civakî ku di nava xwe de hemû civak û baweriyên herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê dihewîne ji aliyê Rêveberiya Xweser a Demokratîk (RXD) ve hate qebulkirin, ji bo hilbijartinên xwecihî ango herêmî dest bi xebatan hatin kirin.**R-4**



Sîpan Şînda
**Gelo Çima Kurdan Mûzeyek li Dîyasporayê Nîne?** R-7

# 'Keça Kurda' mala xwe ya ji heriyê kir muzexane

Di her amûr û rûyê peykerekî de çîrokek heye ku ne bi pênûsê, lê bi tiliyên Hizniya Keça Kurda bi modêl û sitîlan bi şêweyekî hunerî hatiye xêzkirin. Hizinya diyar kir ku Ew jineke kurd e, û bi derfetên xwe yên xwezayî karê xwe dike."

**Birûc Resûl/Qamişlo**

Hizniya Osman ku bi navê Keça Kurda tê naskirin, temenê wê 55 sal e, ji gundê Meşûqê yê girêdayî navçeya Tirbespiyê ye. Hizniya bi tena xwe di mala xwe de jiyan dike. Ji ber ku dayik û bavê wê jiyana xwe ji dest dane, 8 xuşkên wê hene û ew zewcîne û birakî wê tenê heye. 2 xuşk û 9 birayên Hizniya 'Keça Kurda' di temenê 13 salî de jiyana xwe ji dest dane, bê sedemên nexweşiyê wefat, dibûn. Ji ber vê yekê malbata wê navê Hizniya lê kirin, ji ber ku navê wê tê wateya xemgîniyê. Hizniya nêzî 6 salan li Siwêdê jiyaye, lê ji ber ku dayika wê nexweş bû, ew vegeriya welat û mala xwe, nexweşiya dayika wê nêzî 25 sal dewam kir û ew bê liv û tevger li erdê mabû, lê Hizniya hem dayika xwe xwedî dikir û hem jî bi karê destan û amûrên kurdî yên kevnar kom dikirin.

**Pêşengiha wê**

Bihuşteke kurdî di hundurê odeyeke mala Hizniya de ku bûye mîrasekî serdemên kevnar. Li her quncikekê hundirê odeyê de mirov bedewiyê di şiklê gul, dara ku bi salan e, an peykerekî bi heriyê hatiye çêkirin û gelek amûrên bedew û xweşik ku kevneşopiya bav û kalên kurdan têne bîra mirov, dê bibîne. Her wiha di hindirê wê odeyê de zêdetirî 3 hezar parçeyên kevnar dihewîne,



her yek bi nav û çîrokek di bîranîna xwediyê wê de ye. Di her amûr û rûyê peykerekî de çîrokek heye ku ne bi pênûsê, lê bi tiliyên wê bi modêl û sitîlan û bi şêweyekî hunerî hatiye xêzkirin.
Bedewiya pêşangehê ew e ku zêdetirî 150 perçeyên mîrasê yên girêdayî cil û bergên folklorî yên kurdî li ser dîwaran şapikên kurdî bi rengên xwezayî hatine xemilandin û perçeyên xemilandî yên kurdî jî bi rengê xwe yê taybet hatine danîn. Her wiha parçeyên ku ji temenê Hizniya Osman 'Keça Kurda' kevintir in, di pêşengehê de hene. Hin ji wan ji sala 2001'ê ve bi destê xwe çêkiriye, berî ku Hizniya di sala 2006`an de dest bi xebata berhevkirina parçeyên Kevnar û mîrasê kurdî bike, ji bajar û bajarokên herêmê yên weke Qamişlo,Tirbespiyê, Dêrik û beşek ji wan jî derveyê Sûriyê hatine wergirtin.
Wê di sala 2006`an de dest bi berhevkirina berhemên çandî kiriye û di odeya mala xwe de mîna pêşengehekî amedekiriye, di pêşengehê de amûrên hunerî û her amûrên kevneşopî bi cih kirine. Her wiha ramana çêkirina pêşangeheke taybet ji bo mîrateya gelêrî ya kurdî, ji bo parastina wê ji windabûnê, da ku tiştekî bedewreng bi hêz bimîne di bîra nifşên paşerojê de, Hizniya ji mala xwe, gundê xwe û gelê xwe dest bi pêşengihekê kir. Hizniya bi berhevkirina hin alav, nivîsarên taybet û cil û bergên folklorî yên kurdî, gelek alav bi dest xistin. Ji bo ku ew pêşangeha xwe ya piçûk zêde û mezin bike. Hizniya da zanîn ku ji heval û hogiran hin amûrên kevneşop wergirtiye û diyarî wê hatine kirin. Ji bo van amûrên ku çanda kurdan dide nasîn, winde nebe û di hindirê pêşangehê de bimîne û were parastin.
Keça Kurda bi destên xwe hin peyker, firax û alav çêkirine, ji ber ku hinek ji wan tune bûn wê xwest ji nû ve zindî bike, lewra wê piştî ku ramana xwe ji dayika xwe girtiye, ew dest bi çêkirina gelek amûrên çanda kurdî bi heriyê kiriye. Hizniya bi piştgirya dayika xwe û alîkariya wê ku çawa amûrên ku niha winda ne çêbike. Armanca wê ji berhevkirina van berheman ew e ku mîratê kurdî biparêze û di serdema teknolojiya yê de winda nebe û mîrateyên kurdî bi dehê salan bimîne û nifşên siberojê bi mîrate û reseniya bav û kalên xwe bidin nasîn. Hizniya Osman wiha got: "Em kurd bi mîrateya xwe ya kevnar û bi rûmet têne naskirin. Ji ber vê yekê pêwîste her kes xwedî li çand û kevneşopiya xwe ya kurdî derkeve û biparêze."



**Tevlîbûna Keça Kurda ji pêşengihan re**

Hizniya Osman 2 caran tevlî pêşengihên ku li Rojavayê Kurdistanê hatine lidarxistin bûye, lê tenê amûrên xwe yên kevnar yên çanda kurdî dikre û ew amede nebû, ji ber ku rewşa dayika wê ya tendirustî ne baş bû, ji ber vê yekê nikarîbû wekî kesayet tevlî pêşengiha amûrên kevnar bibe. Di vê salê de tevlî pêşnegiha kevneşopiya kurdî li Başurê Kurdistanê (Zaxo) bû.

**Astengiyên li pêşiya kar û xebatên keça kurdan**

Keça Kurdan balkişand ser astengiyên ku li pêşiya wê de derketin û wiha got: "Dema ku min dest bi pêşengihê kir, gelek gotinên neyinî li ser kesayeta min hatin gotin, hinek ji wan min ji malên xwe derxistin, hinekan jî ji ber lidarxistina pêşangehê, li min heqaret kirin. Da ku ew gotinên neyînî nebin li pêşiya pêşketina min kelem, ez wan gotinan paşguh dikim, ji xwe re nakim asas û xem."

**'Pêwîste her kes xwedî li çanda xwe derkeve'**

Kaca Kurd wiha dawî li axaftina xwe anî: "Hêvîdar im her jineke kurd mîrateya xwe biparêze û bi çalakiyên bi vî rengî hemû hêza xwe ji bo xizmeta gelê xwe pêşkêş bike. Ji bo xwe îspat bike û hemû armanc û xeyalên xwe pêkbîne. Wê tu tişt biryardariya min a ji bo parastina mîrata kurdî têk nabe. Ez ê weke jineke kurd bi îmkanên xwe yên kêm û tevî hemû astengiyan jî, kar û xebata xwe berdewam bikim û çand û kelepora kurdî biparêzim."

# 'Xêzkirin bedewiya jiyana min e'

**Ronaz Silêman/Qamişlo**

**Wênesaza ciwan a ji bajarê Qamişlo Rojda Xelîl diyar kir ku wênwsazî hebûn û nasnameya wênesaze û got, "Ez êş û berxwedana gelê xwe bi riya xêzkirinê xêz dikim û wênesazî wateya jiyana min e."**

Di jiyanê de, dema mirov bîrwer dibe dilê wî bi taybetiyekê ve tê girêdan ev taybetî jî, ji hizkirina zêde dibe jêhatiya mirov. Gelek mirov jî hene jêhatiya wan wênesazî ye. Wênesazî yek ji hunerên ku girêdayî çav, mejî û hestên mirov e. Wênesazî ne tenê ew hunera ku wênesaz wêneyekî ji bo diyarkirina xweşikbûnê xêz bike, huner ji vê yekê kûrtir û bi watetire.

**Huner hebûna mirove**

Beriya Şoreşa 19`ê Tîrmehê, civaka Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi çavekî biçûk li karê wênesaziyê dinerîn, lê bi Şoreşa 19`ê Tîrmehê re gelek guhertin rûdan, bi taybet di aliyê kar û xebatên huneriyê de. Êdî wênesaz xwe di warê hunerê de li pêş xistin û civak jî kete wê bawereiyê de ku huner hebûna gelek mirov ye, herwiha kûrahiya hunera wênesaziya baş nas kir.
Derbarê jiyan û girîngiya hunera wênesaziyê, wênesaza ciwan a ji bajarê Qamişlo Rojda Xelîl ji rojnameya me re axivî.
Wênesaza ciwan Rojda Xelîl ku bi temenê xwe 16 salî ye, diyar kir ku xêzkirin bedewiya jiyana wê ye û wiha got: "Di jiyan her mirovekî de, bedewiyek heye, bedewiya min jî xêzkirine. Dema ku temenê min 12`e salî bû, min dest bi karê xêzkirinê kir, hizkirin yan hêjahitya min jêr tinebû, lê min didît ku malbat min ji xêkirinê hez dike, lewra min dît cihê min jî di nava wênesaziyê de heye, bi rastî jî dema min dest bi xêzkirinê kir, min dît ku ew kêfxweşiya min e jî ne tenê ya malbat min bû. Her wiha malbat di karê wênesaziyê de yên ku bûn piştgir ji min re, malbata min bû."

**'Ez êş û berxwedana gelê xwe xêz dikim'**

Rojda Xelîl di berdewamiya axaftina xwe de eşkere kir ku ew tevlî 5 pêşengehan bûye û wiha got: "Di qonaxê fêrkirin û pêşketina min ji wênesaziyê re ez tevlî 5 pêşengehan jî bûm, ew pêşengeh li ser asta Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê bûn, her wiha li van pêşengehan tebloyên min yên ku behsa êşa civak û welatê me dike, hatin pêşandan, di heman demê de hin tabloyên li ser berxwedaniya jinê jî bûn. Tiştê ku min di tevlîbûna van pêşengehan de kêfxweş kirin ew bû ku tevî temenê min yê biçûk tevlîbûna min ji pêşengehê re hat qebûlkirin û ji ber bedewiya tabloyên min jî, min ker wergirt."

**'Wênesazî wateya jiyana min e'**

Wênesaza ciwan Rojda Xelîl axaftina xwe wiha qedand: "Niha ez bûme refa 10`an û li kêleka xwendina xwe jî karê wênesaziyê dikim, di heman demê de 20 zarokî/ê fêrî xêzkirinê dikim. Armanca min ji fêrkirina zarokan ji xêzkirinê re ew ku her kesê cihê xwe di nava wênesaziyê de dibîne li pêş bikeve,



di heman demê de wêneyên wan bikevin xizmeta civaka gelê kurd de. Bi rengê zeytî û fehmî xêz dikim, lê bêtirî wê yên zeytî, her wiha heta niha min 50 tablo xêz kirin e. Di peydakirina alavnan de tenê malbata min bi min re dibin alîkar, lê hemû alavên wênesaziyê li vir nayên peydakirin, di civaka me de jî li wênesaziyê bi çavekî kêm dinerin. Ez bi riya hunerê hest û ramanên xwe derdixim hole, herwiha wênesazî wateya jiyana min e û beyî wê nikarin jiyan bikim."



# Dengê zindî; Hesen Zîrek


Hunermendê navdar Hesen Zîrek ê bi 'Ey Nîştimanê Kurdistan' tê naskirin, beriya 51 salan bi nexweşiyekê koça dawî kir. Hesen Zîrek li pey xwe çandek, arşîvek hêla û hê jî dengê Zîrek zindî ye.

**Navenda Nûçeyan**

Hunermend Hesen Zîrek, di sala 1921'ê de li gundê Hermêlê yê Bokan a Rojhilatê Kurdistanê ji dayik bûye. Gava hê biçûk bûye bavê wî miriye. Piştî dayika wî dizewice, ji neçarî ji gundê xwe dûr dikeve. Zîrek di 12 saliya xwe de terka Bokanê kiriye û çûye bajarê Seqizê. Di 15 saliya xwe de dîsa vegeriyaye Bokanê, lê vê carê li wir pir nemaye û ji bo ji xwe re karekî peyde bike çûye Tewrêz û Tehranê. Di vê navê re Zîrek gelek zor û zehmetî kişandine. Di gelek karan de xebitiye. Hema bibêje tu kar nemaye nekiriye. Zîrek di xortaniya xwe de ji karkerî û şivantiyê bigire di gelek karan de şixuliye. Piştî demekê ji Tewrêzê berê xwe daye Başûrê Kurdistanê. Li wir li bajarê Silêmaniyê li taxa Dergezên bi cih û war bûye. Navê bavê wî Ebdullahe, navê dayîka wî jî Emîne ye. Dema ku bavê wî li gundê Hermêle li cem axayê gund dimîne ji ber jêhatina xwe navê Zîrek lê tê kirin. Ev nasnav bi Hesen ve jî tê kirin û tê gotin Hesen Zîrek.

**Vedigere Îranê û li radyoya Tehran dixebite**

Hunermend Hesen Zîrek ku 51 salan jiyan kir, gelek stran çêkir û li ser radyoyên Iraq û Îranê tomar kir. Zîrek yekem stran a xwe di sala 1953'yan de li ser Radyoya Bexda tomar dike û êdî dengê wî sînoran derbas dike. Li Bexdayê nêzî 70 stran ên kurdî tomar dike. Li her derekê stran ên



wî tên belavkirin û guhdarkirin. Piştî sala 1958'an Hesen Zîrek carek din divegere Îranê, diçe li Tehranê li ser radyoya Tehran beşê Kurdî stran an dibêje. Li ser Radyoya Tehranê 39 stran an tomar tomar dike. Piştre di sala 1962'an de peywendî li gel radyoya Kirmaşan danî û li radyoya Kirmaşanê 83 stran ên xwe tomar dike. Zîrek berhemên xwe yên herî baş dinava wan du salan de bi rêya orkestraya Kirmaşan, bi alîkariya Mamosta Mucteba Mîrzade tomar dike.

**Dengê nemir û heskirî**

Hesen Zîrek li gelek gund, navçe û bajarên Kurdistanê digere, êş û zehmetiyên gelê Kurd bi çavê xwe dibîne. Ev êş û xwezaya Kurdistanê herwiha rojên netewî yên Kurdan bi gotina stran an tîne ser ziman. Zîrek resentiya Kurdî parastiye û ji herkesê re stran gotiye. Ji bona wê ye tevayî gelê Kurd ji dengê Hesen Zîrek hez dikin û guhdar dikin.
Tevî ku xwendin û nivîsandina Hesen Zîrek nebû, lê piraniya stran û helbest yên wî bixwene û ezbere kiriye. Wî bixwe jî mûzîk jêre derxistiye. Evjî yekbû ji taybetmendî û ciyewaziyên Hesen Zîrek. Herwiha bûye çavkanî û rênîşander ji bo sedan hunermendan.

**1500 stran tomar kiriye**

Hesen Zîrek di tevahiya temenê xwede 1500 stran tomar kiriye. Her wiha gelek helbestên helbestvanên weke; Nalî, Wefayî, Seyîd Kamil, Îmamî, Kurdî, Pîremêrd, Hêmin, Tahir Beg Caf vehuhandine û xistiye stran .
Siruda 'Newroz' ku li çar parçeyên Kurdistanê tê naskirin yek ji berhemên wî yên herî binav û denge ku helbesta Pîremêrde, Hesen Zîrek xistiye stran .
Dema Hesen Zîrek dibe 11 salî, bavê wî diçe ser dilovaniya xwe. Piştî wê malbata wê ji gundê Hermêle diçin bajarê Seqiz.Piştre dayîka wî dizewice, lê ev rewş bandorek mezin a neyînî li ser jiyana Zîrek dike û zehmetiyan dikişîne. Piştî ku temenê Zîrek dibe 12 sal carek din vedigere gundê xwe û li mala axayê gund dibe xizmetkar.
Di nav stranên Hesen Zîrek de ya herî bi wate û navdar "Ey Niştiman"e. Zîrek vê stranê di sala 1946'an de li ser Komara Kurdistanê (Mehabad) çêkiriye û li bara civaka Kurdî wekî sirûdekê tê pejirandin. Lewre dema ku Zîrek çûye Mehabadê pêvajo pêvajoya Şerê Cîhanê yê Duyemîn bûye û Îngilistan û Yekitiya Sovyetan li Îranê dixistin. Di wê navberê de bi pêşengiya Qazî Mihemed jî Komara Kurdistanê ava dibû ku piştî 11 mehan komar hat hilweşandin û Qazî Mihemmed û hevalên xwe li Qada Çarçirayê hatin darvekirin. Ev yek bandoreke gelekî mezin li Hesen Zîrek kiriye. Zîrek li ser vê rewşê gelek berhemên giranbuha afirandiye. Ji van berhemên giranbuha yek jê jî "Ey Niştiman" e.

"Ey netewekanî delal
Ey Kurdekan ey baskeşêr
Ey niştiman, niştimanî ciwan
Xakî Aryan wetanî Kurdan
***
Ey rozî Kurdî kaşan
Bo Kawekan li her deran
Ey rozî Kurdî ber efşan
Bo Kawekan li her teraf
***
Bo te dikoşim bi dil û bi can
Bo serkewtinî xakî niştiman
***
Ey keynekan ey lawekan
Tê dikoşim cergê qawmekan
Ey niştiman, niştimanî ciwan
Xakî Aryan wetanî Kurdan
***
Bo te dikoşim bi serkewtinî
Pêşmerge hebû lawî qehraman"

Zîrek di sala 1958'an de li gel Medya Zendî dizewice, du zarokên wan ên bi navê Arezû û Sakar çêdibin û li sala 1971'an de bi nexweşiya penceşêrê dikeve. Piştî salekê têkoşîna bi nexweşiyê re winda dike û di 26'ê Hezîrana 1972'yan de jiyana xwe ji dest dide.
Cenazeyê Hesen Zîrek li ser wesiyeta wî li Rojhilatê Kurdistan li bajarê Bokan yê parêzgeha Urmiye dispêrin axê.

# Bi cilên ku didirûn çanda Êzdatî diparêzin

**Turko Reşo û hevjînê wê Elî Îlyas ji bo parastina çanda Êzdatî cilên taybet ên çandî didirûn.**

Li gundê Aştîqerûm a girêdayî Sinûna Şengalê jina bi navê Turko Reşo û hevjinê xwe Elî Iliyas ji bo tune nebûna çanda êzidî, bi derfeta xwe û buhayeke kêm cil û bergên Êzidî didûrin. Yek ji pîvanên sereke yên jiyana herdû hevjînan ewe ku her dem bi cilên xwe yê Êzidiyan tevbigerin û eşqa li ber kirina wan cilan bixin dilê her Êzidiyekê/î de.

**Zindîhiştina çanda cil û bergan**

Têkildarî mijarê Turko Reşo diyar kir ku ew bi taybetî dixwaze keç û xortên Êzidiyan bi cil û bergên Êzidiyan bibîne û wiha got: "Hedefa min a ji vî karî ev e ku cil û bergên Êzidiyan di nav civakê de zindî bihêlim. Ez derveyî cil û bergên çanda Êzidî cilê din nadirûm. Ez hemû şêweyên cil û bergên êzidî dizanim bidirûm û hedefa min di nav civakê de bi taybetî di nav ciwanan de zindîhiştina çandê ye."
Turko Reşo destnîşan kir ku tevî sê zarokan û karê malê jî gelek kêfa wê ji dirûtina cil û bergên Êzidiyan tê û da zanîn ku gelek kes dema cil û bergên ku ew didûre dikirin pir kêfa wan tê.

**'Divê ciwan ji cil û bergên Êzidî fedî nekin'**

Turko Reşo ku ev salek cil û bergên Êzidî didirû anî ziman ku ew dixwaze cilên Êzidiyan çêbike, li ser ciwanên Êzidî bibîne û ev bang li ciwanên Êzîdî kir: "Divê keç û xortên me ji liberkirina cil û bergên xwe fedî nekin, ji ber her gel û civak bi cil û bergên xwe tên naskirin."
Turko Reşo ku ji bo cil û bergên Êzidî hin zêdetir di nav civakê de bê lixwekirin erzantir difiroşe, bi van hevokan dawî li axaftina xwe anî: "Di demên pêş de ez dixwazim karê xwe berfirehtir bikim û hîn erzantir bifiroşim xelkê. Hêvî û daxwaza min ew e ku hemû Êzidî bi taybetî ciwan cil û bergên spî ya Êzidiyan ên pîroz liberxwe bikin û ev çand neyê windakirin."

**'Cil û bergên me ber bi tunebûnê ve diçe'**

Elî Iliyas ku alîkariya hevjina xwe dike û her cure cil û bergên Êzidî çêdike, got ku Êzidî bi cil û bergên xwe têne naskirin û ev tişt anî ziman: "Cil û bergên me ber bi tunebûnê ve diçe û ger derfeta me hebûna me yê karê xwe hîn berfirehtir bikira. Ji ber vê yekê divê Êzidî van cil û bergan liberxwe bikin, ji cil û bergên xwe fedî nekin. Ji aliyê din ve divê di hemû rojên taybet de liberxwe bikin da ku çanda me winda nebe."

**Nîşaneya Êzidiyan: Tok**

Di nav civaka Êzidiyan de tişta herî girîng ku wek nîşaneya Êzidiyan tê dîtin jî Tok e. Toka ku sembola Melekê Tawis e, di nav civaka êzidî de tişta herî pîroz e. Divê teqez her êzidiyek ji zayînê heta mirinê Toka xwe hebe. Li gorî çand û baweriya



Êzdatiyê her Êzidî di bin kirasên xwe de Tok liberxwe dikin ku divê bi destan û gilover bê çêkirin. Êzidî bi hevoka 'Êzidiyek dema mir divê teqez toka wê/wî li ber hebe da ku ax bizanibe ya/ê mirî Êzidî ye' girîngiya liberxwekirina Tokan tînin ziman. Ji aliyê din ve rengê tokan spî ye û spî tê wateya sadebûn, paqijî û yekbûyîna beden û heqîqeta ku di dil de tê jiyîn.
Derbarê Tok de Elî Iliyas destnîşan kir ku Tok nîşaneya Êzidiyan e, Êzidî bi Tokê têne naskirin û axaftina xwe wiha bidawî kir: "Hêvî û daxwaza me ew e ku êzidî Toka xwe winda nekin."**NÛJINHA**



**Gelo Çima Kurdan Mûzeyek li Dîyasporayê Nîne?**

**Sîpan Şînda**

Kurd weke netewek ji pêncî milyonî zêdetir, heta niha jî hêj şerê man û nemanê dikine. Çi di warê netewî de, çi di warê civakî de, çi di warê ziman, çandî û hunerî de ew hewl didine ku xwe li ser piya bigirine. Lê belê di roja me de di warê civaknasîyê de şert û pîvanên netew bûne, civak bûne, pêşketinê gelekin û mixabin Kurdan hê jî gelek ji van şert û pîvanan pêk neanîne.
Pêşketina civakî û netewî ne tenê di warê hizra nijadî de ye. Ew girêdayî hizra yekgirtina civakî, parastin û xweyî lê derketina nirxên netewî, pêşxistin û nûjenkirina çand, huner, zanist, wêje û mûzîk, hwd ya netewî; lêkolîna dîroka netewî, kom kirin û parastina ji ber mayî û alavên dîrokî û hwd hinek ji van pîvananin. Bê goman, mîrateya netewan di dîroka wan de veşartîye û dîroka wan jî di mîrateyê wan de veşartîye. Mîratê netewî, delîlên hebûn û rabirdûya netewî ne û ew jî di nava belge, tablet, alavên bi lêkolînên arkeolojîyê têne derxistin û hwd de diyar dibine. Ji ber wê, di warê netewbûyînê de, zelal kirina rabirdû û dîroka netewî xebateke gelek girîng e. Ji bûna berhevkirin û parastina van delîl û documentan ji mûze rolekî gelek girîng dilehîzine.
Bê goman gelek cureyên mûzeyan hene, lê belê ya ku ez behsê dikime mûzeyek netewî ye. Dîroka Kurdan ya li Ewropa ne ji ya Ereb, Tirk û Firsan kêmtire û herî kêm du milyon Kurd li Ewropayê dijîne. Li gorî Kurdan ew 3-4 milyonin, lê ez bawer nakime, ji ber ku çi dane di destê tu kesê de nîne. Lê mixabin di warê pêşketin û sazîbûyînê de Kurd li gorî netewên din pir qels in. Gelek kêmasî hene, lê belê bi ya min divê Kurd mûzeyekê li Ewropa vekine û hewl bidine ku him ji Kurdistanê û him jî ji hemû deverên cîhanê alav û belgeyên di derheqê Kurdan de di wê mûzeyê de kom bikine û biparêzine. Çima ez dibêjime ji Kurdistanê jî, ji ber ku dokument û alavên li Kurdistanê jî ne di ewlehiyê de ne. Neyar û xêrnexwazên Kurdan dikarine hergav zirerê bidine wan û ji holê rakine. Jixwe ew dema keysê xwe bibînin vê dikine û heroj dikine jî. Ji ber ku Kurdistan hêj di bin destê talankeran de ye. Ji ber wê, Kurd çi bikine bila bikin, divê ew rojeke zû mûzeyeke netewî li Ewropayê vekine û him dîroka xwe, him jî wehşet û qirkirinên bi taybetî di vê sedsala dawî de li Kurdan hatîne kirin, bidine nîşanî dinyayê. Navê mûzê jî bibe Mûzeya Kurdistanê.
Gelek mînakê mûzeyên netewên din hene. Mînak tu diçî kîjan welatî mûzeyên Cihûyan hene û him dîroka xwe didine nîşandan û him jî tişta bi serê wan hatî. Gelek mûzeyên wan yên modern jî hene û mirov dikare sûdê jê wergire. Hûnê bêjine ew Cihû ne, derfetên wan hene. Erê ew 10 milyon jî tê nînine lê belê bi kêrî xwe hatine û evqas derfet ji xwe re afirandine. Kurd jî dibêjine em ji 50 milyonî zêdetirin. Ewan li her dewletek ya Ewropa herî kêm mûzeyek lê vekirine û mîratê xwe, janên xwe, dîroka xwe û hwd di têde diparêzine. Ez ji dibêjime li hemî Ewropayê bila mûzeyek ya Kurdan hebe ha.
Belê ez dizanime ev hêvîyek û daxwazek ne zehmet e, lê ji bo Kurdan gelek zehmet e. Lê belê divê Kurd vê bikine. Divê Kurdên li ewropa, yên li welêt û yên li welatên din yên cîhanê destê xwe bidine yêk û vê projeyê pêk bînine. Ev ji bo pêşeroja Kurda ye. Hêvîdarim dengê min bigihê hewe.

# ‘Bi hatina havînê re zehmtiyên koçberan zêdetir dibin’

Serokê Nivîsgeha Karûbarên Koçber û Penaberan Şêxmûs Ehmed diyar kir ku bi hatina demsala havînê re êşa koçberên di kampan de zêdetir dibe. Herwiha Ehmed dest nîşan kir ku tenê Rêveberiya Xweser û hin saziyên xwecehî alîkariya koçberan dikin.

**Lîloz Hisên/ Qamişlo**

Di destpêka aloziya Sûriyeyê û rûdana şer li gelek herêman, jimarek mezin ji malbatên Sûrî neçar man ku berê xwe bidin herêmên bi ewle yên dûrî bombebarankirinê, weke herêma Bakur û Rojhialtê Sûriyê an jî koçber bibin weletên derve.
Di Adara 2018’an de êrîşên dewleta Tirk a dagirker û dagirkirina Efrînê jî bû sedema koçberkirina zêdetirî 400 hezar ji şêniyên Efrînê ku bi darî zorê ji bajarê xwe hatin dûrxistin.
Di 9`ê Cotmeha sala 2019`an jî dewleta Tirk dîsa êrîşeke dagirkeriyê li ser herêmên din ji Herêma Bakur û Rojhailtê Sûriyeyê pêk anî, nêzî 500 hezar sivîl ji bajarê Serê Kaniyê, Girê Spî, Til Temir û Zerganê neçarî koçberiyê bûn.
Li Herêma Bakur û Rojhialtê Sûriyê 17 kampên mezin ji bo koçber û penaberan hatine avakirin û bi hezaran kes li van kampan niştecihbûne.
Li gel vê yekê Rêveberiya Xweseriya Demokraîk ya Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê hewil dide ku pêdiviyan ji xwarin, cih, xizmeta tenduristî û perwerdeyê li gorî îmkanan ji şêniyên kapan re peyda bike. Tevî derfetên kêm jî, Rêvebriya Xweser kar û xebatê xwe dimeşîne. Bi hatina werzê havînê êşa şêniyên kampan zêde dibe di tevahî warên jiyanê de ji ber kêmbûna avê û qûtbûna elktrîkê ji ber êrîşên dewleta Tirk a dagirker.



### Hejmara kampên li Bakur û Rojhilatê Sûriyê de

Li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê kampên fermî yên ku Rêveberiya Xweser wan birêve dibe 17 kampin, ji wan 6 li herêma Cizîrê ne û navên wan Hol, Erîşa, Serêkaniyê, Waşokanî, Roj û Newroz e.
Yek li Dêra Zorê ye navê wê Ebû Xeşeb e.
Yek li Reqa ye navê wê Girêspî ye.
2 kamp li Tebqa ne navê wan jî El-mehmûdiyê û El-tiwêhîna ne.
2 Kamp li Minbicin û navên wan Elşerqî Elqedîm û Elşerqî Elcedîd in.
5 kamp li herêma Şehba ne navên wan Efrîn, Elşehba, Veger, Serdem û Berxwedan in.
Kesên ku di van kampan de jiyan dikin ji herêmên cûda ne û dabeşî sê beşan dibin, beşek ji wan koçberên ku bi darê zorê ji cih û warên xwe derketine, wek Newroz, Serêkaniyê, Waşokanî, Girêspî û herêmên Şehba di van kempan de xelkê Efrîn, Girê Spî û Serêkaniyê ne, beşa duyem kampa Roj û ya Hol malbatên çeteyên DAIŞ’ê ne, piraniya wan xelkên ji welatên ereb, Ewropî û hin di nav wan de Sûrî jî hene, beşa sêyem jî kesên ku ji bin kontirola Hikûmeta Şamê derketine û li hin kampan bicih bûne.
Kampa Erîşa piraniya kesên tê de ji Dêra Zorê ne û Kampa Ebû xeşeb jî xelkên Dêrazorê yên ku ji bin desthilatdariya hikûmeta Şamê reviya ne li wir bi cih bûne, her du kampên li Tebqa kesên ku têde jiyan dikin ji Dêra Zorê, Hema, Himis,Tedmur û gundewarên Helebê ne, herwiha kesên ku cihê xwe di her du kampên li Minbic de digrin xelên Helebê û gundewarên wê ne.
Derbarê zehmetiyên ku koçber di kampên li Bakur û Rojhilatê Sûriyê dibînin û bi taybet bi hatina werzê havînê, serokê Nivîsgeha Kar û Barên Koçber û Penaberan a Rêveberiya Xweser Şêxmûs Ehmed ji rojnameya me re axivî.
Şêxmûs Ehmed di destpêkê de bal-kişand ser rewşa kampên Bakur û Rojhilatê Sûriyê û wiha got: “Rewşa penaberên ku di kampên Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê de jiyan dikin û ji hêla saziyên navdewletî ku girêdayî Netewên Yekbûyî ve nehatine nas kirin, pir zehmete. Di sala 2018`an de Efrînê û di sala 2019`an de jî Girê Spî û Serê Kaniyê ji hêla dewleta Tirk a dagirker ve hatin dagirkirin. Ji ber wê xelkên wan deveran koçber bûn û li kampan bi cih bûn, lê ji wê demê de û heta niha saziyên navdewletî tu alîkarî ji bo wan pêşkêş nekiriye. Tenê Rêveberiya Xweser alîkariyê pêşkêş dike.”
Şêxmûs Ehmed destnêşan kir ku Rêveberiya Xweser 17 kampan li Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê birêve dibe, lê Netewên Yekbûyî ji bilî 5 kampan alîkariyê pêşkêş nake, ev dihêle ku barê Rêveberiya Xweser giran bibe.
Şêxmûs Ehemd wiha domand: “Rêveberiya Xweser van kampan bi rêk û pêk dike bi destekdayîna hin saziyên xwecihî alîkariyan pêşkêşî şêniyên kampan dike. Di demsala havînê de mijara herî bi êş ku koçber jiyan dikin tunebûna avê ye, saziyên girêdayî Netewên Yekbûyî raghand ku ew ê ji bo kampên Şehba avê peyda bike û destekdayînê bide, lê di milê kampa Serê Kaniyê û Waşûkanî de pir zehmete peydakirina avê, ev yek jî ji ber êrîşên dewleta Tirk a dagirker ji sala 2019`an ve ku av hatiye qutkirin, ji ber vê yekê ava derdorê tê pêşkêşkirin lê ew jî nepaqije û ji neçarbûnê tê bikaranîn û dibe sedema pir nexweşiyan.



Şêxmûs Ehmed diyar kir ku Rêvebriya Xweser ji bo pêdiviyên rojane, jiyanî, parastin û rêvebriya kampan xebatan dimeşîne û wiha got: “12 kamp bi temamî Rêvebriya Xweser û saziyên xwecihî xwedî li wan derdikevin, lê ji ber hejmara zêde bar giran dibe û pir zehmetî derdikevin. Divê destkedayîn bê kirin ji hêla tenduristî, guhertina çadiran û peydakirina avê, mijarên perwerdê û xizmetguzariya rojane ve.”
Şêxmûs Ehmed wiha pê de çû: “ Weke Nivîsgeha Kar û Barên Penaber û Koçberan di Rêvebriya Xweser de li Bakur û Rojhiatê Sûriyeyê divê desteyên me têkevin warê kar û pratîkê de û alîkariya me bikin ji ber ku saziya tenduristiya cîhanî kar û xebatên xwe di kampan de bi wayekî fermî di dawiya meha Adarê de sekinandin e, ji ber vê yekê divê desteya tenduristî alîkariyê bide, wekî din Desteya Perwerdeyê. Têkiliyên me bi her cihên ku karibin alîkaiyê pêşkêş bikin heye da ku valatiyên ku hene bên dagirtin.”

### Kampên ku herî zêde zehmetiyan dikşînin

Şêxmûs Ehmed bal kişand ser kampên ku herî zêde êş û zemetiyan dikşînin û wiha got: “Di serî de kampên ku kêmanî tê de derdikevin kampa Waşûkanî, Serêkaniyê û Girê Spî ye. Kampên Şehbayê ji ber dûrpêçkirina hikumeta Sûriyê hem ji ber êrîşên dewleta Tirk a dagirker li ser herêmê dihêle ku pêşkêşkirina alîkariyan zehmet bibe.”
Serokê Ofîsa Karûbarên Koçber û Penaberan a Rêveberiya Xweser Şêxmûs Ehmed axaftina xwe wiha qedand: “ Dibe ku pirsgirkek mezintir derbikeve û bar girantir bibe, ew jî mijara vegerandina koçberan yên li welatên cîran, nîqaş hatiye kirin ku bên vegerandin weke koçberên kampa Rukban ya li ser sînorê Urdin û welatên din jî. Hikumeta Sûriyê dibêje ew nikare pêşwaziya wan bike ji ber ku derfet tune ye, di vir de dibe ku bên milê Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê ev yek wê bihêle zehmetiyên li ser milê Rêveberiya Xweser mezintir bibin.”

# ‘Ji bo pêşxistina perwerdeyê minhac tên nûkirin’

**Jîn Hisên/ Qamişlo**

**Hevserokê Saziya Minhacan Hevend Ibrahîm diyar kir ku ji bo pêşxistina asta perewerdeyê wê minhacên perwerdeyê bên guhertin û nûkirin, ev yek jî wê sê salan dirêj bike.**

Saziya Minhacan li Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyayê ji bo pêşxistina pêvajoya xwendin û perwerdeyê kar û xebatan dimeşîne, ji bo guhertina minhacên perwerdeyê ji refên asta seretayî, navîn û amadeyî guhertina minhacan di her du zimanan kurdî û erebî de tê kirin, tê zanîn ku herî dawî nûkirin û guhertina minhacan di sala 2012`an de hate kirin.
Derbarê kar û xebatên ku Saziya Minhacan daye destpêkirin ji bo nûkirin û guhertina minhacan, hevserokê Saziya Minhacan Hevend Ibrahîm ji rojnameya me re axivî.
Hevend Ibrahîm da zanîn ku zêdeyî salekê ye ji bo nûkirin û guhertina minhacên perwerdeyê kar û xebat tên kirin û wiha domand: “Pêvajoya guhertina û nûkirina minhacan li ser sê qonaxan wê bê kirin û di dema heyî de qonaxa yekemîn ber bi dawî ve diçe. Ji bo wê nîqaş tên kirin û li gorî van nîqaşan pirtûk tên sererastkirin. Herwiha guhertina minhacan wê li ser sê salan bê dirêjkirin da ku bandor li xwendekaran neyê kirin.”

### ‘Guhertina minhaca wê li ser 3 qonaxan pêk bê’

Hevend Ibrahîm wiha pê de çû:”Qonaxa yekem wê minhacê refa 1, 4, 7 û 10 bê guhertin, ev guherîn wê di havîna 2024`an berdewam be û sala xwendinê ya 2024- 2025 wê bikeve miriyetê.”
“Wê xwendina refên 2, 5, 8 û 11 li gorî minhacê heyî bê dayîn, wê di qûnaxa duyemîn de di sala xwendinê ya 2025-2026 bê guhertin.”
“Qûnaxa sêyemîn wê minhacê refên 3, 6, 9 û 12 bê guhertin, li gorî guhertinên di qonaxa duyemîn de, wê di havîna sala 2026`an bê domandin, herwiha di sala xwendinê ya 2026-2027’an wê bikeve miriyetê.”

### Hişmendî û naveroka minhacan

Hevend Ibrahîm bal kişand ser hişmendî û naveroka minhacan ya ku ser hatiye avkirin û wiha got: “ Pîvan û naveroka minhacên xwendinê ji xwe li gorî Rêveberiya Xweser ya Demokratîk pê bang dike, weke biratiya gelan, jiyana hevbeş, wekheviya di navbera her du zayendan, tundiya li dijî jinê, rêzgirtina ji kesên din re û qebûlkirina cudahiyê, herwiha zarokan dûrî hizir û ramanê nijadperestiyê bikin û rêzgirtina ji tehavî olan re bê kirin.”

### Rewşa perwerdê li herêmê

Hevend Ibrahîm tekez kir ku rewşa perwerdê li Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê bi awayekî baş derbas dibe û wiha zêde kir:”Bingehên pêşketina xwendinê li herêma me heye, pisporên di warê xwendinê de hene, dibistan û zanîngeh hatine avakirin, hejmara mamosteyan pir başe û têrî perwerdekirina xwendekaran dike, asta fêrkirin û dersdayînê başe, dema derfet hebe em ê zêdetir hewil bidin da ku pêşketinê di warê perwerdeyê de çêbikin.”

### Ji bo pêşketina perwerdê

Hevend Ibrahîm derbarê pêşketina perwerdê wiha anî ser ziman: “Gelek mijarên cuda me nîqaş kirin ji bo pêşketina perwerde di nav de êm ê hewil bidin da ku di aliyê xweza, jîngeh û parastina wê herwiha paqijiya kolan û bajaran weke hişyariyekê çêbikin, ev jî wê bikeve minhacê nû, em ê bi awayekî baş ji xwendekran re pêşkêş bikin, mijar pirin lê ev yên sereke ne.”



Hevserokê Sazîya Minhacan Hevend Ibrahîm tekez kir ku bi guhertinên nû di bernameyan de armanca wan pêşxistina perwerdeyê ji aliyê zanistî ve ye, lê zêde kir: “Em hewl didin ku rêbaza xwendinê ya hifiz ji holê rakin û aliyê lêkolînê li cem xwendekaran pêş bixin.”



# Têkoşîna gelan ya ji bo azadiya Rêber Apo berdewam e

Gelê kurd û azadîxwazên cîhanê bi beşdarbûna xwe ya girseyî di pêngava cîhanî ya ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber Apo de careke din tekez kirin ku ji bo azadiya Rêber Apo û belavkirina fikirê wî, ew ê têkoşînê berdewam bikin.

**Ayşa Silêman/Qamişlo**

Di 10’ê Cotmeha 2023’an de li 74 welatên cîhanê ji bo azadiya rêber Apo pêngavek bi diruşma “Ji Abdullah Ocalan re azadî, ji pirsgirêka Kurd re çareseriya siyasî” hat destpêkirin. Roj bi roj jî ev pêngav berfireh dibe, li tevahiya cîhanê belav dibe û dighêje asta gerdûnî.
Qonaxa yekem ji pêngavê; li Rojava, Bakur û Rojhilatê Sûriyê gelek meş, çalakî û mîting ji bo azadiya Rêber Abdullah Ocalan hatin lidarxistin. Di heman demê de konên çalakiyan jî hatin danîn û pêngava komkirina îmzeyan di hemû tax, gund û bajaran de jî dest pê kir û bi komkirina zêdeyî 3 milyon û 669 hezar û 90 îmzeyî bidawî bû. Her wiha şandina kartpostelan ji bo Rêber Ebdullah Ocalan û çalakiyên xwendina pirtûkan jî hatin lidarxistin.
Komîteya parêzeran jî roleke xwe ya girîng di vê pêngavê de leyîstin, bi riya amadekirina wan ji dosiyaya mafgerî û zagonî re, ya ku ji bo parastina Rêber Abdullah Ocalan di komeleya dewletan de. Di heman demê de daxwaza vekirina dîl li gorî rapirsînên mercên zagon û maf, ji bo raya giştî û rêxistinê navdewletî ku tu rawebûna zagoniya wan tune ye. Êdî gelê kurd qebûl nake ku Rêber Abdullah Ocalan di bin tecrîdê de bê. Di 8’ê Adarê û Newrozê de jî li dijî tecrîdê ast hate bilindkirin, Bi Konseya Ewropayê re hin hevdîtin hatin kirin. Hin dosya hatibûn amadekirine hatin dayîn.




Li gel meş û çalakiyan di çarçoveya kampaniya ‘Şandina 100 hezar qertî’, li her derê ji Îmraliyê re qert hatin şandin. Li Kolnê di çarçoveya heman pêngavê de meşeke mezin hat lidarxistin. Bi heman daxwazî li girtîgehan girava birçîbûnê û xizmên girtiyan jî çalakiyên Nobeda Edaletê pêk anîn.
Qonaxa 2’yemîn de ji pêngavê ya ku di 1’ê Adarê de dest pê kir, bi çalakiyên girseyî dewam kir. Piştî 8’ê Adarê Roja Jinan a Cîhanî Jinan li qadan got ku ‘Azadiya Abdullah Ocalan azadiya me ye’. Di Newrozê de jî gel ji bo rakirina tecrîda girankirî û azadiya fîzîkî ya Rêber Apo da ku ji xwe re esas bigirin daketin qadan. Di navbera 15 heya 19’ê Nîsanê de li ber Komîteya Pêşîlêgirtina Îşkenceyê (CPT) ya Ewropayê û Konseya Ewropayê (KE) yên li bajarê Strasbourg a Fransayê bi 3 hezar kesan çalakiya rûniştinê ya ku 5 rojan berdewam kir li darxistin.
Asta çalakiyê di qonaxa duyemîn de ji pêngava ‘Ji Abdullah Ocalan re Azadî, ji pirsgirêka Kurd re çareserî’ girtiyên di girtîgehan de cara yekem bû ku di vê astê de bi dirûşma ‘Jiyana di nava şert û mercên Rêbertî de ji xwe re dikin esas’ pêvajoyeke radîkal dane destpêkirin ku ev yek gelekî girîng bû. Tevî zexteke giran û şert û mercên tecrîdê jî û qutkirina têkiliyên bi derve re. Her wiha netevlîbûna li serdanên malbatan, bikar neanîna mafê axaftina bi telefonê, neçûna dadgehê sekneke xurt e, ev yek dibe nêzîkatiyeke şoreşgerî ya bi îrade.

### Kopinhagin

Li paytexta Danîmarka Kopinhaginê di çarçoveya Pêngava “Ji Abdullah Ocalan re azadî, ji pirsgirêka Kurd re çareserî” serdanên malan hatin kirin û qertpostal hatin belavkirin. Qertên ku Kurdistaniyan li ser peyamên xwe nivîsandin hatin komkirin û bi awayekî komî şandin ji Rêber Abdullah Ocalan re.

### Basel

Li bajarê Basel ê Siwîsra bi rayedarên Partiya Basta re civînek hat lidarxistin. Şandeya “Komîteya Rêbertî” bi hevserokê Partiya BastA Nîcola Goepfert re hevdîtin kir û dosyaya ku têkildarî tecrîdê amade kiribû pêşkêşî rayedaran kirin.
Di civînê de biryar hat dayîn ku ji bo azadiya Rêber Abdullah Ocalan û girtiyên siyasî çalakiyên hevpar bên lidarxistin.
Di heman demê de li Şengalê jî Çalakiya konvedanê bi armanca azadiya fîzîkî ya Rêber Apo hatibû destpêkirin. Ev çalakî sê rojan berdewam kir.

### Di çalakiyê de bang li CPT’î hat kirin ku bi erkê xwe rabe

Girtiyên azadiyê yên ku di girtîgehên Bakurê Kurdistanê de ne, di çarçoveya Kampaniya Navneteweyî ya “Ji Abdullah Ocalan re azadî, ji pirsgirêka Kurd re çareserî” de, di 27’ê Mijdara 2023’yan de dest bi girava birçîbûnê ya bêdem û dorveger kiribûn. Girtiyan destnîşan kiribûn ku heke heta 15’ê Sibatê roja komploya navneteweyî ya li dijî Rêber Abdullah Ocalan neyên qebûlkirin, dê çalakiya xwe derbasî qonaxeke nû bikin.
Girtiyên PKK û PAJK’î di 3’yê Nîsanê de daxuyaniyek weşandin û ragihandin ku ew ê bi boneya 4’ê Nîsanê Roja jidayikbûna Rêber Ocalan, wê çalakiya xwe ya girava birçîbûnê bi dawî bikin û çalakiya xwe derbasî qonaxeke nû dikin.
Her wiha girtiyan ragihand ku wê çalakiya xwe ya girava birçîbûnê ya dorveger a ku heta niha didan meşand wê berdewam bikin. Di heman demê de pêngava “ Ji Abdulla Ocelan re Azadî, ji pirsgirêka Kurd re çareserî “ ji 4’ê Nîsanê û pê ve bi dirûşma ‘Jiyana bi Rêberê xwe re ya di heman şertî de’ bi boykotkirina dadgeh, serdana malbatê û axaftina bi telefonê bimeşînin.
Çalakiya girtiyên azadiyê ya bi daxwaza azadiya Rêber Abdullah Ocalan û çareserkirina pirsgirêka ku di 27’ê Mijdara 2023’yan de bi girava birçîbûnê ya bêdem û dorveger hatibû destpêkirin, di roja 183’yan de bi qonaxeke nû, bi çalakiya boykotkirina hevdîtinên ser telefonê, malbatan û dadgehê berdewam bû.

# Mekanîzmaya dewletê hişt ku karesat mezin bibe

**Navenda Nûçeyan**

**Jimara kesên ku di şewata di navbera navçeya Çinar a Amedê û naçîeya şernexê ya Mêrdînê de derketibû, gihişt 13 kesan. Hevşaredarê Şemrexê Kûdret Ûçûk diyar kir ku mekanîzmaya dewletê hişt ku karesat mezin bibe.**

Di şewata ku di navbera navçeya Çinar a Amedê û navçeya Şemrex a Mêrdînê de derket bandor li ser 19 taxan kir û her ku diçe hejmara miriyan zêde dibe. Hejmara kesên di şewatê de jiyana xwe ji dest dan gihîşt 13 kesan. Fadil Demîr ê ji gundê Kelekê ya Şemrexê ku li nexweşxaneyek Amedê dihat tedawîkirin, duh bi şev jiyana xwe ji dest da. 12 kesên di şewatê de miribûn duh hatibûn veşartin.
Navên kesên ji ber şewatê jiyana xwe ji dest dane wiha ne: “Li gundê Kelekê Rezan Yilmaz, Azat Yilmaz, Mazher Demîr, Nûrî Demîr, Taliha Demîr, Hasan Demîr, Şeyhmûs Demîr, Resûl Yilmaz, Sînan Devîren hatin definkirin li gundê Helberê İsmil Yardim û li gundê Tobiniyê jî Ubeydullah Bugdayci û Abdurrahman Bugdayci hatin definkirin.”
Hevşaredarê Şemrexê Kûdret Ûçûk di derbarê şewatê de ji ajansa ANF’ê re axivîbû.
Kûdret Ûçûk diyar kir ku derketina şewatê, belavbûna wê û windakirina jiyanê, tevî hemû bangan jî mekanîzmaya dewletê nekete nav tevgerê û ev rewş hişt ku karesat mezin bibe.
Ûçûk destnîşan kir ku kapasîteya nexweşxaneyan ji bo dermankirina birîndaran têrê nake û wiha got: “Ji şevê ve em bang dikin. Şaredariyên me yên Wan, Şirnex û Amedê hemû derfetên xwe seferber dikin, lê wezaret bêçalak in. Gelek birîndarên rewşa wan giran hene. Divê di bin hin mercan de bên dermankirin. Hem personel û hem jî alav li nexweşxaneyên herêmê têrê nakin. Destpêka şewatê, belavbûna wê û windakirina jiyanê li ber çavan e.”

### Bi dezenformasyonê hewl dan berpirsyariya dewletê veşêrin

Hevşaredarê Şemrexê Kûdret Ûçûk diyar kir ku şewat di bin kontrolê de ye, lê li hin deveran di nava zozan û mêrgan de hê jî cîhên dişewitin hene hene û ji bo van deran jî pêvajoya sarkirinê didome. Ûçûk destnîşan kir ku daxuyaniyên wezaret û rayedaran ên der barê şewatê de rastiyê nîşan nadin û destnîşan kir ku bi manîpulasyon û dezenformasyonê hewl didin mezinahiya karesata veşêrin.



Kûdret Ûçûk got, “Ji duh bi şev û vir ve bi sedan kes seferber bûne. Gundiyan bi derfetên xwe hewl dan agir vemirînin. Heta sibehê me gelek caran telefon kir. Me got şewat derketiye. Divê helîkopterek bê şandin, agirkuj û ambulans bişînin herêmê , lê wezaret neçalak in Li vir wêraniyeke hovane pêk hat, bi kîlometreyan erd şewitî û bû xwelî.”

# Hilbijartinên Herêmî yên Bakur û Rojhilatê Sûriyê û bandorên wê...(1)

Piştî di 15'ê Kanûnê 2023'an de Hevpeymana Civakî ku di nava xwe de hemû civak û baweriyên herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê dihewîne ji aliyê Rêveberiya Xweser a Demokratîk (RXD) ve hate qebulkirin, ji bo hilbijartinên xwecihî angU herêmî dest bi xebatan hatin kirin. Ji bo nûjenkirina komîn, meclîs û şaredariyan ku herî zêde di madeyên Hevpeymana Civakî de ciih girtine, pêwîstî bi hilbijartinekî hat dîtin. Li ser vê esasî RXD'ê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê biryara ku di 11'ê Hezîranê de hilbijartinên heremî (xwecihî) çêbibe da.

**Erdoxan Altan**

Kêmasî û nebesiyên di allYê hiqûqî, îdarî û hwd de ku di hilbijartina herêmî ya cara yekemîn di 2017'an de çêbibûn ji bo careke din derne-kevin holê di çerçoveya Hevpeymana Civakî ya nû de madeyên derbarê sererastkirina partiyên siyasî, namzetên serbûxwe û hwd de pêvajoyeke hilbijartinê hat destpêkirin.

Di vê çerçoveyî de li Kantona Cezîrê, Dêrazorê, Reqa, Firat, Minbic, Efrîn-Şehba û Tebqa de 6 bajarên mezin, 40 bajar û 105 bajarok (belde) an de wê hemwelatî biçin ser sendoqan û deng bikar bînin.

Wê bi tevahî 30 partî tevlî hilbijartinan bibin. Ji van partiyan hin ji wan wê îtîfaq ava bikin û biçin ser sandoqan. Ji bilî partiyên ku wê bi nav û logoyên xwe tevlî bibin hin partî bi îtîfaq û kesên serbûxwe jî tevlî bibin. Ji van "Îtîfaqa Ji Bo Azadiya Gelan û Jinan" ku Partiya Yekîtiya Demokratîk (PYD), Partiya Yekîtiya Sûryanî, Partiya Asûrî ya Demokratîk, Partiya Pêşverû ya Sûriyê û Kombûna Jinên Zenûbiya jî di nav de 22 partî û rêxistinan pêk tê.

Dîsa îtîfaqa bi navê "Îtîfaqa Ji Bo Xizmetek Baştir Bi Hev Re" ji 5 partiyan pêk tê. Di vê îtîfaqê de Partiya Kesk ên Demokratîk, Tevgera Hemdemî ya Kurdistan, Partiya Biratiya Kurdistanî, Partiya Çepgir a Demokratên Kurd ên Sûriyê û Yekîtiya Karkerên Kurdistan (YKK) cih digirin.

Ji bilî van partiyan Partiya Îtîfaqa Demokratîka Niştîmaniya Sûriyê, Partiya Veguhertin a Demokratîk û Bilindiya Neteweyî û Partiya Yekîtiya Demokratîk a Kurd ên Sûriyê jî Wê tevlî hilbijartinan bibin.

Konseya Neteweya Kurd a Sûriyê (ENKS) jî bi daxuyaniyekê diyar kir ku ew dê hilbijartina xwecihî ya şaredariyan boykot bikin. Di daxuyaniya xwe de jî sedema boykotkirina hilbijartinan bi zimanekê dijber rave kir û ev tişt gotin: "Ev hilbijartin hilbijartina yek partiyê ye. Em tevlî van hilbijartinan nabin, li gorî me ne rewa (meşru) ye. Partiyek li gorî serê xwe bi hêzên xwe yên leşkerî re hilbijartinê pêk tîne. Mesela gelê me ne hilbijartina partiyekî ye".

RXD, aşkere kir ku 3 milyon zêdetir hilbijêr dikarin dengê xwe bikar



bînin. Her wiha koçberên ku bi şertê 5 sal zêdetir li herêma RXD jiyan kirine dikarin dengê xwe bikar bînin.

### Partiyan pêş hilbijartinên xwe çêkirin

Di vê çerçoveyî de îtîfaqa bi navê "Îtîfaqa Ji Bo Azadiya Gelan û Jinan" ku ji 22 partî û rêxistinan pêk dihatin li gelek belde, bajêr û bajarên mezin hilbijartina pêşnamzetên xwe çêkirin.

### Dîtin tevlîbûn zêde ye gef û êrîş destpêkirin

Di çerçoveya pêş hilbijartina namzetên ku li heremî hatin kirin tevlîbûn û eleqaya civakî zêde bûn, bi taybet Parastin û ENKS ê ku vê pêvajoyî ji nêz ve dişopand, bi piştgiriya tora civakî ya dewleta Tirk a dagirker re dest bi gef û êrîşan kirin. Li ser van bingehan operasyona hişmendî angu şerê psîkolojîk de xwestin zemînê şer ava bikin û rasterast bingeh ji dewleta Tirk a dagirker re ava bikin û kirin jî.

### Taloqbûna hilbijartinan û sedemên wê

Weke ku tê zanîn Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê di dîroka gelên cîhanê de xwedî cihekî watedar, girîng û taybet e. Mînaka ku nûnertiya şoreşger, mûxalîf, hemû gelên ku ji ber moderniteya kapîtalîst a heyî bêzar bûne dike, hemû tevgerên muxalîf, hemû beşên civakê, karker, kedkar, jin û ciwanan ên ku ji vê sîstemê acizin, temsîl dike.

Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê her tim bi zanebûna vê erkê xwestiye mezinbûna xwe îspat bike. Ji bo mezinbûna xwe îspat neke her tim ji hundir û derve rastî êrîşan hatiye. Gelek derdorên ku Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê, hebûna wê, modêla jiyana wê û pergala ku dixwaze ava bike, ji roja damezrandina xwe ve rastî êrîşên cûr bi cûr hatiye. Hinekan ji kurdayetiya wê aciz bûn, hinekan ji stratejiya ku dixwest di yekîtiya kurd-ereb de çêbike, hinekan ji ber ku projeyek bi pêşengiya jinan bû, hinekan ji pirrengî, pirzimanî û pirçandîtiya wê aciz bûn. Bi taybet ev aliyên xeta xiyanetkar û hevkariya dewleta Tirk a dagirker dikin, di tirsa ku ev paradîgma dê rojekê bi ser bikeve û dê zirarek mezin bide berjewendiyên me yên takekesî û malbatî. Bi gotineke din çiqas ji vê paradîgmayê aciz hene ewqas jî hezkirin û dostên wê jî hene.

Niha Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi êrîşên giran re rû bi rû ye. Xuya ye ev kesên ku me behs kir, ji aliyê dewleta Tirk a dagirker ve tên birêvebirin. Dewleta Tirk a faşîst-mêtînger û qirker xwedîyê sereke û nûnerê hemû sedemên ku me anî ziman e. Ew ji her tiştî aciz dibe. Ji ber di Bakurê Rojhilatê Sûriyê de ji hebûna Rêveberiya Xweser a Demokratîk bêzar bûye. Ji ber vê yekê jî xwe berpirsyar dibîne ku li ser navê her kesî êrîşî Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê bike. Ji bo vê jî dixwaze piştgiriya her kesî bigire.

Tê zanîn ku Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji raya giştî re ragihand ku ew ê hilbijartinên herêmî pêk bînin. Jixwe dihat zanîn ku demeke dirêj amadekariyên wiha dikir. Ango amadekariyek wisa ne sirî û veşartî bû, di çarçoveya pîvanên vekirî, demokratîk de hat kirin. Li Tirkiyeyê her kesî dizanibû ku demeke dirêj e amadekariyek wiha tê kirin û jixwe ji nêz ve jî dişopandin. Piştî ku desteya hilbijartinê an jî komîsyona hilbijartinê ya Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê roja hilbijartinê eşkere kir, bala we lê be Tirkiyeyê tu bertekên cidî nîşan neda. Endamên ENKS'ê û partiyên girêdayî wê yên ku nûnertiya hevkarên bi Tirkiyê û xeta xiyanetkariyê dikin her tim nerazîbûna xwe li dijî vê hilbijartinê anîn ziman. Li hemberî hilbijartinê her tim helwesta xwe ya dijminane nîşan didin. Ew dizanin ku ti hêza wan a beşdarbûna vê hilbijartinê nîne. Ew baş dizanin ku di hilbijartineke wiha de pêkhateyeke zêde ne girîng in. Ew baş dizanin ku di pêvajoyeke wiha ya hilbijartinê de raya giştî an jî gel wan qebûl nake. Ji bo vê jî her tim li dijî hilbijartinê helwesteke dijber nîşan didin. Yên ku bi zimanekî hevkar û xiyanetkar, devê Tirkiyê bi kar anîn, êrîşî vê hilbijartinê kirin, ew in. Xwe li ser PDK'ê, serokê xiyanetkarên hevkar, ku ji wî îlham girtine, ava kirin. PDK û ENKS bi hev re li dijî vê hilbijartinê rawestiyan. Dest bi êrîşan kirin, gotin ku em vê hilbijartinê rewa nabînin, azad nabînin û ji bo ku ev hilbijartin pêk neyê jî dest bi xebatên dîplomatîk ên navneteweyî kirin û di her firsendê de êrîş kirin. Lê belê ev hilbijartinek hêsan bû, hat zanîn ku herêmên Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê her tim bi awayekî sîstematîk ji aliyê Tirkiyeyê ve di navberên demkî de rastî êrîşan tên. Ev avahî û sîstemek e ku berê di dema şer de ava bûye. Hat zanîn ku ew sîstemeke ku di şerê li dijî El Nûsra de çêbû, şerê li dijî DAIŞ'ê, di nav şerê li dijî pêkhateyên çeteyan de xûliqiye, piştre derbasî asta çaplûka bûye û niha jî sîstemeke ku dixwaze rabe ser lingan û bimeşe ye.

### PDK û ENKS'ê bi daxûyanıyên xwe bangî tirkiyeyê kirin

Piştî êrîşên El Nûsra, êrîşên DAIŞ'ê, bi kurtasî êrîşên komên çete hatin şikandin, her wiha piştî ku ev hemû proje û êrîşên rejîmê hatin pûçkirin, Tirkiye li ser navê hemûyan kete nava tevgerê û bê ku sedem û hincetên siyasî, leşkerî, ewlekarî, aborî û hwd hebin bi awayek bênavber êrîşên xwe li ser Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê didomîne. Qet nesekinî. Dem bi dem bi çeteyên ku organîze kiribû, dem bi dem bi êrîşên berfireh ên balafiran, dem bi dem bi êrîşên dagirkeriyê, dem bi dem bi êrîşên xwekujî yên ji hêla komên şaneyên veşartî ve û helbet vê yekî bi domdarî kir. Êrîşî binesazî, avahî, qadên jiyanê û destkeftiyên Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê kirin û nehiştin ku xizmeteke baştir ji welatiyan re were kirin. Ev hilbijartin ji bo başkirina kalîteya jiyanê li herêmên Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê girîng hatin dîtin.

Di vî warî de ev hilbijartin hilbijartina rêveberiyên herêmî ye. Ev hilbijartin di heman demê de hilbijartina rêveberên herêmî ye ku dê ji bo sererastkirina binesaz û avahiyên ku di encama êrîşan de zirar dîtine û ji bo xizmetguzariya çêtir projeyan çêbikin. Diyarkirina rêveber û serokên ku dê van karan bi cih bînin hilbijartin e. Tê zanîn ku ENKS'ê û pêkhateyên girêdayî wê pirsgirêkeke wiha nînin. Tê zanîn ku PDK'ê wê bi vê sererastkirinî dilxweş nabe. Xeta xiyanetê ya hevkar bi zelalî fêhm kir bê çi destek û alîkariya derve, ji tu cihî re ji peydakirina van xizmetguzariyan ên ji civakê re nayê, hemû bi çavkanî û nirxên xwe yên xweser pêk tîne, ji bo vê jî ev yek wan ditirsîne. Ji ber vê yekê li dij derket. Ew ji vê hilbijartinê ditirsiyan, mîna ku ji boçikek ditirsin. Wana vê yekî qîr kirin û dewleta yekem Tirkiyê bû ku vê qîrkirinî bihîst.

Weke tê zanîn piştî ragihandina roja hilbijartinê, Tirkiyê destpêkê ti bertekek hişk nîşan neda, lê dema ku ENKS û PDK'ê li dijî vê yekê qîriyan, daxuyaniyên weke dewleta Tirk ku weke xwedî û parêzvanê xwe dibînin, bang kirin. Di encamê de hikûmeta şer a AKP-MHP'ê, ji aliyê Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê, lidarxistina hilbijartinekê bi vî rengî li cihekî di nava xaka Sûriyeyê de weke pirsgirêka bekayê îlan kir û weke sedema şer nirxand.

Di civîna Lîjneya Ewlekariya Milî (MGK) de, dîsa bi devê hin berdevkên desthilatdariya faşîst a AKP-MHP'ê, hilbijartinên li herêmên Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê ji bo 'yekparebûna welat' weke xetere hat nirxandin.



# Hêrsa komkujiya Kobanê bû bingehê berxwedan û hêza têkbirina DAIŞ'ê

Sibeha roja 25`ê Hezîrana 2015`an kolanên bajarê Kobanê û gundê Berxbotanê bibûn gola xwînê. Li tevahiya kolanan cenaze hebûn. Kolan bibûn şahidê bûyerek xemgîn û şûnek sîl nabe di bîra her kesî de hişt.

**Avêsta Menaf /Qamişlo**

Kobanê ya bi navê xwe bû kelha berxwedan û serkeftinê yek ji bajarên Rojavayê Kurdistanê ye ku yekemîn car gavên şênber ên têkoşîna azadiya gelê kurd û Kurdistanê lê hat avêtin. Gelê Kobanê bi vê gavê re bîrdoziya tevgera azadiya Kurdistanê nas kir û bi wê gava yekemîn şûnde bû cihê berxwedan û serkeftinê. Lewra ew gava pîroz a ji tevahî gelê Rojhilata Navîn û cîhanê re bû çavkaniya hêvî û baweriyê ji 1979`an ve heta 2011`an rêxistinbûneke xurt xwe weke gel ji xweliyê xwe afirand û bi wê afirandinê gava yekemîn a şoreşa 19`ê Tîrmehê hat avêtin. Ev şoreşa ku bi pêşengiya jinan xwe bi felsefeya û birdoziya azadiyê perwerde kir, hat destpêkirin di roja me ya îro de li tevahî herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê belav bûye û ji bo Kurdistan, Rojhilata Navîn û mirovahiyê bûye çavkaniya hêvî û berxwedanê.

### Çeteyan bi hemû hêza xwe êrîşî warê şoreşê kirin

Şoreşa ku li Rojavayê Kurdistanê dest pê kir û navenda wê Kobanê bû, gelek hêzên desthilatdar ji bo xwe weke xetere dît. Di wê navberê de projeya çeteyên DAIŞ`ê derdikeve holê ku li gelek welatan êrişên hov pêk tîne û bi taybetî li Sûriye û Iraqê xwe bi cih dikin û gelek bajaran desteser dikin. Dewleta tirk ku dijminahiyeke dîrokî bi gelê Kurd re daniye û her wiha hebûna xwe li ser bingehê tunekirina gelê kurd ava kiriye, çeteyên DAIŞ`ê ji bo berjewendiyên xwe bi kar tîne û di 15`ê Îlona 2014`an de berê êrişên wan dide Kobanê. Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan di wê navberê de bangewaziya xwedîderketina li Kobanê û rêgirtina li ber çêbûna komkujiyan dike. Pişt re seferiya xwedîderketina li Kobanê tê ragihandin ku bi hezaran keç û xortên Kurd berê xwe didin Kobanê û li rex şervanên YPJ`ê û YPG`ê li dijî DAIŞ`ê şer dikin. Piştî berxwedana ku 134 rojan berdewam dike, Kobanê di 27`ê Çileya 2015`an de ji çeteyan ve tê rizgarkirin.

### Kêfxweşiya vegera welat nîvco ma

Piştî mizgîniya tunekirina DAIŞ'ê ji Kobanê gelê wê ku koçberî Bakurê Kurdistanê bibûn, bi lez û bez vedigerin warê xwe û di nava bermahiyên şer de dijîn. Piştî zayîna nû ya gelê Kobanê, wan roj bi roj malên xwe ji nû ve ava dikirin. Di nava hestên kêfxweşî û metirsiyê de, çeteyên DAIŞ`ê bi alîkariya dewleta Tirk di 25`ê Hezîranê de êrîşî navend û gundewarên Kobanê dikin. Çete komkujiyên hov ku bi çekan, sator û şûran bi sedan kes qetil dikin. Di vê komkujiya ku weke rojeke reş ket dîroka gelê Kobanê de, 233 kesan jiyana xwe ji dest dan.

### Piştî çend mehan ji têkçûna DAIŞ'ê, bi piştgiriya tirkiyê derbasî kobanê bû

Li gorî gotinên gundiyan, saet 04:00'ê seharê komek ji 80 heta bi 100 çeteyên biyanî û sûrî ku cilên YPG'ê li xwe kiribûn tevî 8 erebeyên leşkerî bi dizî ji gundên başûrê Kobanê ber bi bajêr ve çûn. Lê berî wê jî bi çend mehan li heman bajarî 5 hezar çeteyên DAIŞ'ê li kolanên wê hatin kuştin û têk çûn.

Çete dabeşî du koman bûn, ya yekê yekser ber bi bajêr ve çû, ya din jî li derdora gundê Berx Batan belav bû. Komê ji tariya şevê û cilên YPG'ê ji bo derbasbûna bajêr sûd girt.

Piştî derbasbûna bajêr, çete li ser banê xaniyên bilind û hin herêmên stratejîk; firûna alî, avayiya Rêveberiya Xweser, riya Heleb a başûrê bajêr, derdora benzîxaneya Mistefa Derwêş, taxa Kaniya Kurdan a rojhilatê bajêr, taxa Cemarik, Qada Azadî ya nava bajêr, Sûka Hal a kevinn û Kolana 48, belav bûn.

6 şervanên Hêzên Ewlekariya Hundir, 4 ji wan ji gundê Berx Batan li erebeyekê siwar bûn û dan dû karwan û zanîn ku ne şervanên YPG'ê ne, lê di ketina bajêr de hatin gulebarankirin.

### Ji 3 eniyan ve DAIŞ`ê hewl da Kobanê kontrol bike

Kolan bû gola xwînê, di encamê de ji zarok û jin û extiyaran 233 kes şehîd bûn.

Di wê navê de şervanên YPG/ YPJ'ê bi desteka asîmanî ya Koalisyona Navneteweyî operasyona rizgarkirina bajarokê Sirînê ji çeteyên DAIŞ'ê dimeşand. Dewleta Tirk deriyê Mûrşid Pinar yê li nêzî Kobanê vekir ku erebeyên bombebarkirî yên çeteyên DAIŞ'ê derbasî bakurê bajêr bibin.



6 şervanên Hêzên Ewlekariya Hundir di şerê bi çeteyan re ya li nêzî avayiya rêveberiya kantonê ya bajêr şehîd bûn. Bi vê re şerê li kolanan dest pê kir. Sekvanên DAIŞ'î yên li ser banên dibistan û avayiyên stratejîk bi cih bûyên her kesê didîtin gule berdidanê.

### Komkujî derket asta qirkirinê

Rêbazên herî hovane yên serjêkirin û gulebarankirinê li dijî gelê Kobanê pêk anîn. Bi kurtasî her cûre amûrên ku di asta navdewletî de hatine qedexekirin û her cûre rêbazên dermirovî yên ji aliyê çeteyên DAÎŞ'ê ve hatin bikaranîn. Çeteyan bi cil û bergên Yekîneyên Parastina Gel û 'Artêşa Azad' êrîşî sivîlên di malên wan de kirin, ketin malên wan û her kesê ku rastî wan dihat şehîd dikirin. Li gorî gelek raporên rêxistinên mirovî, komkujiya ku ji aliyê çeteyên DAÎŞ'ê ve hatiye kirin, derketiye asta qirkirina Kurdan.

### DAIŞ dîsa li kobanê têk çû

YPJ, YPG û Hêzên Ewlekariya Hundir li gel welatiyan nuqteyên bicihbûna çeteyan li bajêr dorpêç kirin. Di 3 rojên şerê li kolanan de YPG'ê piraniya çeteyan kuştin û hin çeteyên xwe bombe kiribûn jî girtin.

### Bîlançoya komkujiyê

Di daxuyaniya Meclisa Rêveber a kantona Kobanê ya 21'ê Tîrmeha 2015'an de hat eşkerakirin ku komîteya lêpirsîna rastiyan diyar kir ku di komkujiyê de 233 sivîl şehîd bûne. Ji wan 27 sivîl ji gundê Berx Botan in. 273 sivîl jî bi guleyên çeteyan birîndar bûn. Di 3 rojên paqijkirina bajêr ji çeteyan de nêzî 30 şervanên YPG, YPJ û Hêzên Ewlekariya Hundir şehîd bûn.

# 'Guhertina demografiya Efrînê sûcekî dijmirovî ye'

**Navenda Nûçeyan**

**Dewleta Tirk a dagirker li Efrîna dagirkirî planên kuştin, revandin, koçberkirina şêniyên resen û guhertina demografîk bênavber didomîne. Dagirkerî bi alîkariya hin dezgeh û saziyên Qeterî, Kiwêtî û Filestînî kamp û malên mitîngeriyê ava dikin, herwiha hewil dide demografiya herêmê bi giştî bidin guhertin. Hevseroka Desteya Hiqûq û Edaletê ya Rêveberiya Xweser Ya Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê Mizgîn Hesen diyar kir ku guhertina demografiya li Efrînê sûcekî şer e û pêwêste saziyên navneteweyî li hemberî vî sûcî bi erkên xwe yên exlaqî rabin.**

Ji destpêka dagirkirina Efrînê ve, dewleta Trik a dagirker û çeteyên girêdayî wê tevhî sûcên dijmirovî li hemberî şêniyên wê yên resen pêk tîn in. Dagirkerî li pêş çavên tevahiya cîhanê qirkirina xwezayî, çandî û mirovî dike. Bi armanca guhertina demografiya herêma Efrînê û tevahiya herêmên dagirkirî kamp û malên mitîngerî tên avakirin. Herî dawî jî Heyva Sor ya Qeterî bi alîkariya dagirkeriya



Tirk 13 avahiyên niştecihbûnê li Bakurê Sûriyeyê avakirin.

Derbarê mijarê de hevseroka Desteya Hiqûq û Edaletê Mizgîn Hesen ji rojnameya me re axivî.

Mizgîn Hesen di destpêka axaftina xwe de bal kişand ser binpêkirinên dewleta Tirk yên domdar yên li dijî gelê Efrînê û wiha got: "Weke tê zanîn ji destpêka dagirkrina Efrînê, ji sala 2018`an ve heta roja îro gelek kiryarên dijmirovahiyê li ser xaka Efrînê hatine kirin, di nava van kiryaran de îşkence, kiryarên dijmirovî li dijî şêniyan pêk tê herwiha kuştina bê sûc û gelek cureyên ku dikevin bin banên kiryarên dijîmirovahiyê û sûcên şer ji hêla dewleta Tirk a dagirker û komên çete yên girêdayî wê ve tên kirin."

Mizgîn Hesen destîşan kir ku di encama dagirkerî û êrîşên hovane yên dewleta Tirk û komên çete yên girêdayî wê ve gelek şênî ji malên xwe bi darê zorê koçber bûn, dev ji mal û milkên xwe berdan, herwiha ev komên çete dest danîn ser erd, zevî û milkên teybet yên ku bi salan berhev kirbûn.

Mizgîn Hesen axaftina xwe wiha domand: "Milkyeta taybet yek ji bingehên pernesêbên mafên mirovan yê cîhanê ye ku di 1949'an de li ser hatiye sekinandin, milkyetên taybet tu kes nikare dest deyne ser, lê berovajî vê yekê em îro li ser xaka Efrînê dibînin ji hêla komên çeteyên girêdayî dewleta Tirk a dagirker ve ev yek pir zêde tê kirin. Dagirkerî her tiştî ji bo xwe rewa dike, bajarekî ku bi kurdetiya xwe hatiye naskirin weke Efrîn, guhertina demografîk tê de tê kirin li pêşiya raya giştî û cîhan bêdeng maye."

Mizgîn Hesen wiha li axaftina xwe zêde kir û got, "Ji xwe gelek dezgeh û rêxistinên cîhanî û dervî cîhanî dixwestin biçin derbarê kiryarên li wir çêdibe lêkolîn û lêpirsînê bikin, lê belê nehiştin ku derbasî bajar bibin ji ber bi derbasbûna wan wê kiryarên qirêj derkevin holê, Hevya Sor ya Qeter û saziyên mîna Kiwêt bi hevkariya dewleta Tirk li ser erda Efrînê kampên mêtîngeriyê ava dikin ji bo kesên nû ku tu eleqeya wan bi Efrînê re tune ye tê de bi cih bikin."

Mizgîn Hesen tekez kir ku kiryarên guhertina demografiya herêmekê li dijî pernesîbên mafên mirovan e û dibe sûceke şer di zagonên navneteweyî de.

Mizgîn Hesen wiha berdewam kir: "Li hemberî van kiryaran tu dezgeh û saziyên navneteweyî heta niha di derbarê vê mijarê de bertek nîşan nedane, ev jî ji bo parastina berjewendiyên Tirkiyê û komên çete yên girêdayî wê diyar dibe, pirsgirêkên parastina berjewendiyan hene, naxwazin bi destwerdana bi lez di vê mijarê de bikin. Tirkiyê dixwaze Efrîn ji bo komên çete bixe navend di heman demê de herêmê ji çanda kurdî ya ku bi hezarê salan berxwedan hatibû kirin jê qut bike."

Mizgîn Hesen wiha got: "Eger em di warê qanûnî de li vê mijarê binêrin kiryarên ku tên kirin derxistina hemwelatiyan ji xaka wan, koçberkirina bi darê zorê û bicihkirina kesên din li şûna wan ji bo demografiya wê bighuerînin ev yek dikeve bin banê sûcên şer û jenosid, qanûna navneteweî bi awayekî tekez sererast dike."

Mizgîn Hesen diyar kir ku çi dezgeh an saziyên mafên mirovan ku bizanibe ku li ser erdekî bi vî awayî guhertina demografîk pêk tê û dibe hevkarê vî sûcî, çi Heyva Sor ya Qeterî be an dezgehên berî niha yên Fîlestînê herwiha Kiwêt ew dibin berpirsyarê vê mijarê.

Mizgîn Hesen di dawî de got kiryarên bi vî rengî divê bighêjin saziyên huquqî yên girêdayî Netewên Yekbûyî û wiha domand: "Ev berpirsyariyek mezin e dikeve ser milê saziyên mafên mirovan, di destpêkê yê hundirîn piştre yê derve, di serî de divê hemû saziyên me yên kurdî ku bi mafên gelan bang dikin, ji bo rûmeta mirovan gerek li mijara Efrînê û guhertina demografîk ku li xaka wê pêk tê xwedî lê derkevin, saziyên ku van kiryaran li ser xaka Efrînê pêk tînin gerek li hember wan bertek bên nîşandan, neqebûlkirinek çêbibe di eynî demê de dengê xwe bighêjin saziyên huquqî yên navneteweyî yên girêdayî Netewên Yekbûyî û xebat derbarê sekinandina vê kiryarê bê kirin."